# BEYANA PARTIYA DEMOKRATI KURDISTAN
# - IRAQ -

Kongirê nehan ê Partiya me bi wirdi Raburdu,neha û ayinda Partiya me,a Gelê me,Şureşa Ilula piroz û Şureşa Gulana 1976 xist ber çav,her wehaji ew şasbûnen siyasi ku bûn ziyan bi tevgera Gelê me li Kurdistana Iraq bi taybeti û ji bona tevgera Netewê Kurdî parkirî bi tevayi,pêrejî li wan şaşbûnen sazmendi û laşkeri ji têmaşekir.
Ji ber veji Kongire Raporê Partiya me ê Konfirênsê aba sala 1976 de,di babeti şaşbûnen Sûreşa Ilona sala 1961 de a piroz de û serpêhatiyên wê,rê nuh a Partiya me lî jêr ronahiya wê serpehatiyê ew Rebaziya Partiya meyi nuh pêşin da, û ew Raporê Siyasi bi Wesiqeyeke mêjûyi ê parti danî ji bona di kar û barên Parti û Sûresê de li ser ronahiya wi pir sûd u kar bête wergirtin.
Serpehatiya Şuresa Ilul da xuyanikir ku hic li bin rewş û zineteké de û ji ber her sebebekê jî be,piştgirtina Impiryalizma Emeriki û Nokerén wê nebe bête kirin:ji ber evana eger betin pişt jî bigrin,ew pştgirtina han bi xwe têtên girtin li bal Dujminên Kurd ên bingehine,her wehajî ew Dujminên hemû Gelên Azadixwazên li tevayâ Cihane de.Yarmetiya wan bi xwe bes û bi tenha ji bona hilweşandina wê tevgeré bi xwe ye.Her weha Serpehatiya Şureşa Ilun pêşan da ku Erkên tevgera Netewetiyi azadixwazi Kurd li her perçayeki Kurd divê cihekî taybeti hebe bi şeweyeki weha ku bi rêkeve li gel perçewendi Gelê Kurd li hemû perçên Kurdistan û bi rêkeve li gel percewendi pêşveru en Gelén Heremê.
Di Şûreşa Ilun de çend şaşbûnen din bu ku bi taybêti ziyan li parti û şureş da,çi di warê nav û deng be,çi di warê pêwendiya me bi hêzen Nestiman perwerên perçên Kurdistana tir.Yekek ji wan şaşbûnen ku partiya me bi karêki ne rewa u ziyan bi xwe datine,û bi taybeti Dujminên Şuresa Ilunê û Miletê me,ji bona piropegenda xwe û ji bona percewendiya xwe bi kar anin,bi şêweyeki taybeti d-ijî Şûreşa Ilunê û partiya me,ew ji bi dana Laşé Suleyman Muini bi Iran.
Her weha li Kongirê nehan ê partiya me derket ku bi hoyê zineta taybeti yi Partiya me di dawiya ketina 6 adara sala 1975 de li layeki,u li layeki din bi hoyê belavbûna Endamên Serokitiya Parti û mijûlbûna hinekan ji wan bi amedebûna kar û barên Kongire,her wehaji hewildani Nokerên Rêjimê Basi li Iran di dema alozi de li Kurdistan,bi hêviya tekdana Pêwendi di nava Hizba Demokrati Kurdistani Iran de û Hêzên Welatperwerên dini Iran û E me bi gelek perabûnen istifzazi û xirab li ser kêsê Gelê Kurd û Gelén tiri Irani ew helsan bi tevlihevkirina rewş û zineta Iran û xistina kelem li pêşiya sûresa piroz a Iran,ku têde diyar dibe piştgirtina bi cihanina hêviya Gelê Kurd li Iran û Iraq de.Evana tev bi hev re bûn hoyê çend pêrabûnên şas li Iran,ên ku li gel Rêbazi Partiya me bi rê nakevin,bi taybeti pişti ku pêwendi di navbera Komara Islamiyi Irani de û Partiya Demokrati Kurdistan de li Iran û di navbera hêzên Welatperwerên Kurdistaniyî din de gihane rêyeke girtî,bi destpêkirina serê bira kujyê,di vê deme de Pêşmergên me,ên ku Beşeki ji wan li Iran bûn tûşi çend şaşbûnan bûn,ewbû li Şino çend Genc ji Xelkên wê hatin şehid kirin,di wê dema ku Bajare Sino ew bi xwê cihe Sahnazi u serbilindiya me ye,ku her u her çaki û piyatiya wan ji bîr nakin.Her wehaji hatiye zanin ku ê me bûne kelem li ber gelek çalakiyên Partiya Demokrati Kurdistana Irane de,ku waye li Pawe,li Şino û dôrhêla Ormiyê,her wehaji rudaniyek yan dudo ku cihê daxin ku pereji vegirtina hin wargehên én ji bal Pêşmergên Partiya Demokrati Iran hatibûn çolkirin.
Divê pir bi basi bête zanîn ku bîr û baweriya Partiya me pes û paş Kongire bi taybeti li gora biryariyên siyasi û sazmendi,ku ew şaşbûnén hatibûn kirin li nik hinekan ji Pêşmergên me û Berpirsiyarên Partiya me ew nacolin li gora siyaseta partiya me û ew nehatine kirin li gora biryariyên wê,belki ew karana karên Kesana bi tenha xwe bûn.Divê pir bi çaki û başi bête zanin ku xebat û çalakiya partiya me û yekitiya hêza Rêberiya wê,em didin zanin ku bi hic corek şaşbûnen wisa nabin betin kirin û bi her awayeki kirin wisa diven betin qedexekirin.Em didin zanin ku xebata me bes û bi tenha qada Kurdistane, cihe rast tqine ê xebata Partiya me ye,ku ewji Kurdistana Iraq bi xwe ye.Em xebatê dikin ji bona pêkanina bereki welatperweriyi pêsverû li ser seranserya Kurdistan u Iraq ji bona hilweşandina sustema Faşi û bî cihanina Sustemeke Demokrasiyi Beriyî pêşverû ku di bin siya wê de Ewtonomiya rast u durust ji bona Kurdistan tête bi cihanin.

Her wehaji êm didin xuyanikirin,ku em bi tucoreki desdirêjyê nakin di kar û barên Iraniyi nav xwe bi sêweyeki ku dijwari û keleman peyda dike,belê li gora biryara Kongirê me a kû dibeje em dirin:Kongire pistgirtina xebata Gelê meyî Kurd li Kurdistana Iranê dike ji bona mefé xweyi Milîyî dad.Kongire bang Komara Islamiyi Irani û her wehaji bang dike ji bona Hêzen Welatiyên Kurd bi Rêberiya Partiya Demokrati Kurdistan li Iran dike ji bona karkirinê ji bona rawestandina pêrabûnen serê laskeri û bi gihandina carkirineke asitiyi Demokrasiyi dad bi girawkirina Ewtonomi(Xwedmoxtari)ji bona Kurdistana Iran di nava çarsinorê Komara Islamiya Iranê de.Her wehaji Kongire bangi hemû Hêzen Islami, Demokrasi û Pesverû li Iran dike ji bona bi hemu sêweyeki bête hewildan ji bo carekirina Pirsiyariya Kurd bi coreki Asitiyî Demokrasiyi dad li gora qazancên Gelên Irani di nava Komara Islami de.

Em didin zanin bi amadebûna xwe bi carekê ji bona tirxankirina hemû karinen xwe bi xistina bin destên herdû aliyan de ji bona carekirineke asitiyi dad ji bona pirsiyariya Kurd li Iran."Em didin zanin,ku em amadene ji bona danina hemú karinên xwe di bin destên Komara Islami de di bin Rêberiya Xumeyni de u di bin destê Partiya Demokrati Kurdistani bira li Iran ji bona bi cihanina daxwazên dad ên Gelê Meyi xwesewest li Iran di rêya gift û go bi asiti.

Siyaseta Rêberiya Partiya me û a Seroke wé beri Kongirê nehan beramberi Kurdistan Iran wehabû,ku bi her coreki karkirin li gora karinî ji bona yarmetiya gihandineke ji bo carekirineke dadi asiti ji bona pirsiyariya Kurd û ji bona pêrûnistina Komara Islami bi cihê û rola taybetiyi a Partiya Demokrati Kurdistani Iran di nava Cemawerên Xelkén Kurd de.Di vi wari de,di dema serkirina bira kujyê Partiya me û Rêberiya wê bi van gavan rabûn,ku ew pirbûn,û bi agehdariya Berpirsiyaren Komara Islami û Birayén me di Partiya Demokrati Kurdistan li Iran,her wehaji ev karana bun bi agehdariya Hêzen pêvrû ên Dost li Iran û Erdimê.Ev rastiya hanjî pir eskereye ji her keseki.

Neha em careke din didin zanin ku Partiya me bi tucoreki careke ji caran dujminitiya Parti Demokrati Kurdistan li Iran nekiriye û ew tucari jî nake,le belê ew her û her destê Dostanyé jêre direjkir ye ji bona hevkariyā bi hev re. Partiya me careke din banga xwe ji bona Hêzen Welatiyi Pêsverûyi Irani û bi taybeti ji bona Komara Islami bi Rêberiya Xumeyni û bi Rêberiya Partiya Demokrati Kurdistan li Iran,pisti derxistina Imam daxuyaniya xweyi mejuyiyi giring, ji bona bi karanina hemû karin u karen xwe ji bona carekirina pirsiyariya Kurd bi sêweyeki asiti li Iran li ser bingehé bi cihanina Awtonomi(Xwedmoxtari) di carsinorê Komara Islami de,ji bo xurtkirin u yek kirina hemû hêzén Gelên Irani diji pilanên Impiryaliya Emerki,Sehyonizma Cihani û Kevneperestiyê û sustema Fasi li Iraq.

Bi taybeti di vî nire ku Impiryaliya Emeriki bi sêweyeki harbûye li ser Iran bi pilanên xwe ve xweser diji suresa piroz a Gelên Irani,Partiya me dibine ku bi her awayeki pewiste pistgirtin u yarmetiya Komara Islami li Iranê de di bin Rêberiya Imam Xumeynide di vê deme de ew bi xwe erkeki pir giringe li ser milê hemû Hêzen Pêsverû li Erdimê u li Cihanê.

M E K T E B A  S I Y A S I

24. 11. 1 9 7 9 de